

Şoreş û Nîv-Şoreş di şoreşa
Jîna de

»»» R:8



Raperîna Li Rojhilatê
Kurdistanê û Girîngîya Xebatên
Li Dîasporayê

»»» R:2

Serkotbûn Êdî Sembola
Azadiyê ye

»»» R:6


Îran êdî bombeya etomî
dixwaze!

»»» R:7

*Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

Agirî

Duhestînameyek Siyasî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdi
www.agirimedia.org Hejmar (433) 06-11-2022 Buha (1000) Tûmen



Bavê Komar:
Lewma min navê
kurê xwe kir Komar
çimkî li 25`ê Gelawêjê
jidayîk bibû.

Raperîna Li Rojhilatê Kurdistanê û Girîngîya Xebatên Li Dîasporayê



N: Mustafa Oziçelik
Serokê Giştî yê Partiya
PAKê

Qetil kirina keça Kurd Jîna Emînî, li Rojhilatê Kurdistanê û li Îranê bûye mîladeke nû. Êdî tu tişt dê wekî duhî nemîne. Îro ji duhî cuda ye, sibê jî dê ji îro cudatir be. Bi taybetî hevgerî, hema-hengî, helwest û siyaseta hevbeş a Navenda Hevkarîyê ya Partiyên Kurdistanê Îranê, di dîroka Rojhilatê Kurdistanê da rûpelekî nû yê neteweyî, niştimanî vekirîye. Bi beşdarî û berfireh kirina bi aliyên din ên neteweyî, Kurdistanî yên li Rojhilatê Kurdistanê, ev yekgirtina biqîmet, dê bikaribe bingehê guhertinên mezin ava bike. Raperîna li Rojhilatê Kurdistanê gihîştîye asteke nû, girseyî û organîzekirî.

Raperîna gelên Belûcî, Faris, Azerî, Erebi, Tirkmen, di eslê xwe da barê gelê me yê Rojhilatê Kurdistanê siviktir dike; rê nade ku Kurd tenê bibin armanca êrîşên Dewleta Îranê.

Bawer dikim, partiyên me yên Rojhilatê Kurdistanê, ji bo ev raperînan li Rojhilatê Kurdistanê û li Îranê bi awayekî hevbeş bîne organîze kirin di nav hewleke cidî da ne. Lê mixabin raperîna gelên Îranê ne di kontrol û organîzeyê navendekê da ye. Ev jî hinek xeterî û fikareyan bi xwe ra tîne.

Lê raperîna gelên Kurdistanê û Îranê, êdî cîh li Rejîma Îranê teng kirîye.

Berîya her tiştî divê Navenda Hevkarîyê ya Partiyên Kurdistanê Îranê û hemû partiyên



din ên neteweyî, niştimanî yên li Rojhilatê Kurdistanê, bi awayekî berfireh xwe amadeyî guhertinên mezin jî, xwe amadeyî êrîşên mezin ên Dewleta Îranê jî bikin.

Carina bûyereke wek a kuştina keça Kurd Jîna Emînî, ya ku ji carekê ve rûdaye, dikare bibe destpêka guhertin û şoreşên mezin jî. Hemû partiyên neteweyî, niştimanî yên li Rojhilatê Kurdistanê, ji bo ku bikaribin ji wan firsendên mimkune ku bê ber derîyê wan feyde werbigirin, divê amadekarîyê berfireh bikin.

Helbete em baş dizanin ku, di konjonktura heyî da, ji bo guherînên li welatekî, hêza gelê li wî welatî tenê têrê nake. Gelek caran aktorên derekî roleke tayînkirî dîlîhîzin.

Di rewşa heyî da, ji bo rûxandina vî Rejîma Dewleta Îranê, nuha tu planeke cidî, xurt, berbiçav û berfireh a Emerîkayê û dewletên din naxuyî. Lê nayê wê wateyê ku, dê van raperînan tesîrê li ser siyaseta Emerîkayê û dewletên din nekin. Emerîka ji Rejîma Îranê aciz e û dixwaze darbeyeke mezintir lê bide. Heger hêzên Rojhilatê Kurdistanê xwe baş amade bikin û wê bawerîyê bidin ku dikarin welatê xwe îdare bikin, di encama van raperînan da, Rejîma Îranê dikare darbeyeke mezin bixwe,

mecbûr bimîne di warê azadîyê û mafên mirovan da hinek guhertinan bike û dikare van raperînan, ji bo Kurdistan, ji bidestxistina hinek mafên neteweyî, demokratîk bigirin, heta otonomîyê, heta heta sistemeke federalî jî rê vekin.

Di sala 1991ê da gava ku Emerîkayê midaxaleyî Iraqê kir, ji ber ku li Iraqê opozîsyoneke ku bikaribe bawerîyê bide Emerîka da ku Iraqê îdare bike tunebû, operasyona Emerîkayê nîvçe ma. Lê ji ber ku Kurd organîzetir bûn, Emerîkayê û dewletên hevpeyman rê danê ku Kurd sê bajarên xwe rizgar bikin. Lê rizgar kirina sê bajarên Başûrê Kurdistanê bingeha rûxandina rejîma Seddam Huseyinî û li Iraqê bingeha ava kirina sistemeke federalî ava kir. Ne ihtîmaleke pir dûre ku Emerîka, li Rojhilatê Kurdistanê jî, rê ji herêmeke otonom an bidestxistina mafên neteweyî yên gelê me yê Rojhilatê Kurdistanê ra veke, da ku bingehê rûxandina Rejîma Îranê ava bike. Berjewendî û siyaseta Emerîkayê û ya hinek dewletên din, dê tesîreke tayînkirî li ser şeweyê van guhertinan bike. Lê berîya her tiştî divê Kurd bi xwe amade bin. Qelsîya herî mezin jî bîrêxistinbûyî û neorganîzebûna gelên Belûcî, Azerî, Faris, Erebi û Tirkmenên ku li Îranê ne. Ev rastîya ku em behs dikin, hêvîya ku nuha guhertinên

mezin li Îranê bibin hinekî lawaztir dike.

Îro di demeke ku gelên Rojhilatê Kurdistanê û Îranê li ser pîyanin; ji aliyekî ve piştgirî û alîkarîya hemû Kurdên li her perçeyekî Kurdistanê û li cîhanê wek wazîfeyeke neteweyî, niştimanî derdikeve pêş; ji aliyekî ve jî xebatên li dîasporayê dikare roleke gelekî girîng bilîhîzin.

Kurdên li dîasporayê li gel gelên Îranê, bi xwepêşandan û çalakîyên cûr bi cûr, di nav aktîvîteyê baş û berbiçav da ne. Ev hêzeke mezin dide raperîna li Rojhilatê Kurdistanê û Îranê.

Lê ji îro pê ve, belkî ya baştir ewe ku, ev çalakî û xebat rengêkî nû bigirin û bigihêjin asteke bilindtir. Berîya her tiştî, divê li dîasporayê, hemû dezgehên dîasporayê, dezgehên sîvîl, partiyên siyasî, kesayetên navdar, parlamenter û serok û endamên meclîsên şaredariyan yên Kurd, li dîasporayê, Navendekê Piştgirîyê ya ji bo raperîna Rojhilatê Kurdistanê û Îranê ava bikin.

Navenda Hevkarîyê ya Kurdî Li Dîasporayê, divê hewl bide da ku bi hemû partiyên siyasî, dezgehên sîvîl, kesayetên navdar yên opozîsyona vî Rejîma Îranê ra peywendîyên xurt daynin û mimkun be Navendekê Hevbeş a Piştgirîyê Li Dîasporayê, ku ji gelê me yê Rojhilatê Kurdistanê û gelên Îranê pêkhatî ava bikin.

Navenda Hevkarîyê ya Kurdî Li Dîasporayê, divê bi Sosyalîst Enternasyonalê, bi yekîtiyên partiyên liberal û mihafazakar, bi Yekîtiya Ewropa, Konseya Ewropa, Neteweyên Yekbûyî, bi Komkara Welatên Erebi û hemû dewlet û dezgehên navneteweyî ra, bi kesayetên navdar yên cîhanê ra hevdiîtinên berfireh bikin, da ku piştgirîya

»»»Doma R:2

raperîna Rojhilatê Kurdistanê û Îranê geştir û berfirehtir bikin. Divê ev germahîya raperînê sar nebe û dinya zêdetir li gel vê raperînê be. Navenda Hevkarîyê ya Kurdî Li Dîasporayê, li gel rêxiştin û dezgehên Belûcî, Faris, Azerî, Erebi, Tirkmenan dikarin bi ştrambêjên navdar ên cîhanî ra peywendîyan daynin, da ku bikaribin konsertên bi beşdariya milyonan kesan li welatên cuda cuda li dar bixin.

Navenda Hevkarîyê ya Kurdî Li Dîasporayê, li gel rêxiştin û dezgehên Belûcî, Faris, Azerî, Erebi, Tirkmenan dikarin,

li hemû welatên dîasporayê, di dawîya hefteyêke tesbît kirî da, di hemû maçên fûtbolê û basketbolê da, di eynî rojê da, çalakîyêke aştiyane û balkêş organîze bikin, da ku zêdetir piştgirîya gelên cîhanê wergirin.

Navenda Hevkarîyê ya Kurdî Li Dîasporayê, li gel rêxiştin û dezgehên Belûcî, Faris, Azerî, Erebi, Tirkmenan, divê hemû rêyên dîplomasîyê bikar bînin, da ku li Netewên Yekbûyî, li Konseya Ewropayê û li Komkara Erebi bikaribin axaftinekê bikin û daxwaza piştgirîya dewlet û gelên cîhanê bikin.

Navenda Hevkarîyê ya Kurdî Li Dîasporayê, li gel rêxiştin û dezgehên Belûcî, Faris, Azerî, Erebi, Tirkmenan, divê daxwaza hevdişînekê bi Serokê Netewên Yekbûyî û bi Serokê Emerîkayê John Biden ra bikin.

Hêza lobî û dîplomasîyê, hêza dîasporayê, îro jî her demê zêdetir derdikeve pêş. Navenda Hevkarîyê ya Partîyên Kurdistanê Îranê û hemû partîyên Rojhilatê Kurdistanê, bi piştgirîya hemû kurdên li dîasporayê yên jî her çar perçeyên Kurdistanê, li gel rêxiştin û dezgehên Belûcî, Faris, Azerî, Erebi, Tirkmenan vê hêza

dîplomasîyê, lobîyê û dîasporayê çiqasî bikaribin rakin ser pîyan, dê gelê me yê Rojhilatê Kurdistanê û gelên Îranê ewqas zûtir û zêdetir mafên xwe yên neteweyî, demokratîk, mafên azadiyê, wekhevîyê, mafên mirovan bi deşt bixin û dê ewqas zûtir rê li ber van zordestîyên Rejîma Îranê bêne girtin, dê temenê vê Rejîma Dewleta Îranê hîna kurttir, kintir be.

02.11.2022

Mustafa Özçelik

Serokê Giştî yê PAKê

Teşkilata PDKÎ, amara şehîd, birîndar û binçavkirîyên serhildana seranserî li Kurdistanê belav kir

Pêka amara ku Navenda Teşkilata PDKÎ, Ji destpêka serhildan seranserî li Kurdistanê heta niha, 66 kes hatine şehîdkirin ku 10 kes ji wan jin û 56 kes jî mên in ku 25 kes ji wan şehîdan li parêzgeha Sine, 21 kes li parêzgeha Urmiyê, 15 kes li parêzgeha Kirmaşan, 3 kes li parêzgeha Îlamê, welatîyek jî xelkê Qûçan û welatîyek din jî xelkê bajarê Xuremabadê bûye ku ji aliyê hêzên rejîmê ve hatine şehîdkirin.

Teşkilata Hizbê di rapora xwe ya amarî de daye zanîn ku, di Rojhilatê Kurdistanê de 960 kes hatine binçavkirin ku 141 kes ji wan jin in û 809 kes jî mên in.

Ji vê rêjeyê 341 kes ji parêzgeha Sine, 371 kes ji parêzgeha Urmiyê û 149 kes ji parêzgeha Kirmaşanê û 100 kes ji parêzgeha Îlamê ne.

Herwisa amara birîndarbûyan li Rojhilatê Kurdistanê wiha ne: “Parêzgeha Sine 20 kes, parêzgeha Urmiye 45 kes, parêzgeha Kirmaşanê 2 kes û li parêzgeha Îlamê jî 2 kes”.

Amara seraşt a birîndaran gelek zêdetir ji vê amarê ye û pêka berevirdan zêdetir ji 3,500 kes bûne ku piraniya wan ji tirsê binçavkirinê ve neçûne nexweşxaneyan û di malan de hatine dermankirin.



Amara şehîdên serhildanê ji 26ê Xermanan heta şeva Şemî 14ê Xezelwerê

Pêka dawî amarên belavbûyî ji 26ê xermanan heta şeva Şemî 14ê Xezelwerê 318 kes şehîd bûne û 14 hezar û 802 kes jî hatine binçavkirin.

Pêka amarên “HRANA”yê ji 26ê Xermananê heta şeva Şemî 14ê Xezelwerê 318 kes şehîd bûne ku 49 kes ji wan şehîdan zarok in û 14 hezar û 802 kes jî hatine binçavkirin ku bi tenê nasnameya 1784 hes hatiye zanîn.

Ji aliyê dinê ve Saziya Mafê Mirovî ya Îranê di roja derbasbûyî de belav kiriye ku hejmara şehîdan gihîştîye bi 314 kesan ku 47 ji wan zarok in û zêdetir ji 14 hezar û 170 kes jî hatine binçavkirin ku bi tenê nasnameya 1768 kes hatiye zanîn.

Pêka raporên hêzên ewlehî bi gulleyên şer û saçmeyî bi awayê rasrasta û ji nêzik ve teqe li xwenîşanderan dikin û rejîm jî timên nîşançiyên jî, ji bo teqekirin li serhildêran mifahê verdigre.



Mihemedsahl Qadirî: “Encam dan navbirî got: “Ev serhildan destpêka proseyeke girîng ya hevpar di navbera hemû neteweyên li coxrafiyaya siyasiya Îranê de ye”.



**Mihemedsahl Qadirî
Nûnerê PDKÎ li Hew-
lêrê**

Min digel rêzdar Mihemedsahl Qadirî Berpirsê Nûneratiya PDKÎ li Hewlêrê li derheq dawîn bûyerên Rojhilatê Kurdistanê û Îranê hevpeyvîn encam dan navbirî got: “Ev serhildan destpêka proseyeke girîng ya hevpar di navbera hemû neteweyên li coxrafiyaya siyasiya Îranê de ye”.

P: Dawîn bûyerên Rojhilatê Kurdistanê û Îranê çawan dinirxînin?

B: Eyane ku ew bûyerên serhildana Rojhilatê Kurdistanê û Îranê, destpêka proseyeke girîng ya hevpar di navbera hemû neteweyên li coxrafiyaya siyasiya Îranê de ye ku, bi awayeke bê hempa, ew raperîna wan pêgeha desthilata rejîma Komara Îslamiya Îranê êxistiye lertzîne û dixwaze bo rûxandina vê, anku xebat û têkoşîna pêş bixin, yanî destpêka proseyeke girînge bo rûxandina vê rejîmê, herçend ew serhildana han çê dibe bi hin sedemên wek nebûna opozisyonê yekgirtî ku pêşengatiya wê bike ji aliyekê û ji aliyê din ve bi sedema tepeseriya hêza rejîmê ber bi lawazbûnekê ve here, an bi sedema nebûna piştevaniya navdewletî, nekare di demê kurt de bigihîje bi encamê, lê dikare bi awayekê yekgirtî derfeta vê hindê çê bike ku di demên paşerojê de ku wextê ew du karesat min anîn ziman, vê valahiyê tijî bikin, yek wekê opozisyonê seranserî hebe, aliyek dinê piştgiriyeke navdewletî hebe, bê guman yê vê rejîmê ber bi rûxanê ve bibe, alîkî dinê dikarin bêjim wan bûyerên han karî bandoreke zêde mezin li asta navxweyî û ya navdewletî de

pêk bîne ku êdî em dikarin bi xatircemî ve bêjin rejîma Komara Îslamî ji niha şûnda vê serhildanê tevî mahîta vê pêşî vê serhildanê guhertinek tê de çê bibe, ew guhartin jî yek tirsê geşenekirina vê serhildanê di nav xwe de bo wê karekê bike ku ew serhildana han zêde pêş nekeve, ya din jî di bin givaşa saziyên navdewletî û helwêsta siyasiya welatên derve, neçar dibe ku hindê sextgîriyên xwe li warê olî ve li ser mijara jinan bi taybetî yan reftara karbideştên wan ew reftara tund ya zulm û serkutkirina xelkê kêmek ji wan tiştên xwe guhertineke nerim pêk bîne ku bikare kontrola vê rewşa heyî bike yanê em dikarin bêjim ew hereketa vê carê ya serhildana han ku bi yekîtiya hemû neteweyên Îranê û hemû pêkhatan hate lidarxistin, dengvedanek mezin çê kir û bandoreke girîng li asta navxwe û asta navdewletî de çêkir, lê, bi sedema vê yekê ku opozisyonê yekgirtî nîne ku pêşengatiya vê herketê bike, ji aliyek din ve hêj siyaseta welatên zilhez bo piştgîrîkirina vê opozisyonê yan vê raperîna bo rûxandina vê rejîmê hêsta negihîştîye ve merhelê, mixabin rejîm yê bikare bo heyamek demkî wan raperîna han kêmekê lawaz bike, lê, ew nayê vê wateyê ku ew raperîna li paşerojê bi awayeke xurtir neyên lidarxistin.

P: Di rewşa niha ya serhildana Rojhilatê Kurdistanê û Îranê erkên partiyên Kurd çi dibe?

B: Ew serhildana niha li Rojhilatê Kurdistanê bê guman barekî giran dixê ser milê hemû partiyên xebatkar yên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê, ew jî berî her tiştî eva ye ku ew hêz û aliyên siyasî cuda ji wan cudahiyên bîr û ramanên ku di navbera wan de heyî bi her rengekê lê di mijara girêdayî bi xebata dijê rejîma koma Îslamî de, li mijara piştevanî jî wê raperîna han yekdeng bin yekrêz bin hevaheng bin dakû ew hevahengî û yekrêziya wan bikare bawerî-



yek zêde di nava gel de pêkbîne bikare bibe hêzekî zêdetir hem di qada hereketa navxweyî hem jî di qada xebata dîplomasî de yên girêdayî bi ragihandin û girêdayî bi hêza Pêşmerge, li ber ku bûyerên ku niha li Rojhilatê Kurdistanê û Îranî yan Rojhilata Navîn de çê dibin bûyerên gelek lezgînî û bandora wan li ser yek heye, lewma hewceye ku hêzên Rojhilata Kurdistanê jî bikevine nava tevgera tedbîrên amadekariyê heta ku bikarin li hember wan bûyerên tene pêş çî bo xwe paraştinê yan jî bo mifah wergirtin ji derfetekê bi gelê xwe ve girêdayê bin û bikarin karîgeriyê çê bikin, li ber wê jî ez bawerim berî her tiştî zerûreta li hev nêzîk bûn, yekrêzî, bi hev re hevaheng bûn û kar kirin di hemû qadên xebatê de eva dikare erkeke be li ser milê hemû partiyên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê weke bersiv dayînekê be bi wê zerûreta han li hember serhildana gelê Kurd ku çêbûyê, hewceye partiyên me ku çawan di nava gel de serhildan bi awayekî yekrêzî têt lidarxistin bi wê awayî jî partiyên siyasî bersivê erênî bidin bi yekrêzî û hevahengiyan wan.

P: Dersxwan û xwandekar bi berdehamî wênayên Xomeynî û Xamneyî parçe

parçe dîkin û dihavêjin, ev yek çî peyameke bo rejîma Îslamî?

B: Ya ku em dibînin xwandevanên di xwandîgeh û zanîngehan de an xelkê tex û qatên cuda cuda yên civakê wêne û hêmayên rêberên rejîma Komara Îslamî di herifînin û tînin xwar û dişewitînin, di heqîqet de wedigere bo bilind bûna asta hişyariya siyasî ya civakê ku piştî 44 salan êdî dizanin ewê rejîmê li tevahiya temenê xwe de çî daxwaziyek xelkê cîbicî nekiriye û êdî xelkê çî bawerî û hêviyek bi wê rejîmê nemanê û hêvî bi çî qewl û qirarên lêbanok yên karbideşt û berpirsên rejîmê nemanê, ber hindê jî êdî rejîmê li tevahiya temenê xwe de mehkûm bi nemanê dîkin.

Bi wê wateyê ku ew hereketa han cudatir ji herketên hemû carên din e ku eger pêştir hereket weke nerazîbûnê bo wê ku daxwaziyek xwe bînin cî weke giranî, bêkarî û ... hwd, daxwaziyên xelkê di warê xizmetguzariyên rojane de bûn. Lê, vê carê xelkê êdî çî daxwazî tunîn in, cuda li wê hindê ku dixwazin ew rejîm biherife yanî ew helwêsta han ku hêmayên rejîmê û rêberê wê rejîmê kirine armanc bi nêrîna

»»»Dom R:5

»»»Doma R:4

min hişiyariya siyasî ya wî xelkî ye ku mahiyeta rejîmê li tevahiya temenê xwe de naskirine û îradeya wan bo herifîna wê rejîmê ye.

P: Bo berdewambûn û ser xistina vê şoreşê xelk dibe çi bikin?

B: Ji bona berdewamkirina vê serhildanê dikarim bêjim xelkê Kurdistanê hewceye bi awayekê waqî'îbînaneraperîna li Rojhilatê Kurdistanê wekû beşek li raperîna hemû beşên dinê yê Îranê bête hêlsengandin daku li gor waqîyeta heyî li gor îmkana û derfetên heyî bi awayekê wekû têçûyeke kêmtir û telefatek kêmtir di eynî hal de bikare destkevtên ku heta niha bi dest xwe ve înanî biparêzin û di eynê hal de ew destkevtên han bi sebeba vê yekîti û yekrêziya ku di navbera gelê Kurd û li hemû bajaran di nav qat û texên cuda cuda yên gelê Kurd çêbûye, ew dê biparêzin an ya herî girîng paraştina yekîti û yekrêziya nav rêfa gel e, ya duyem jî waqî'îbîniyeke siyasî ye ku dûr ji aliyê heştekê ye ku bikarin wê rewşa han çawan îdare bikin, an jî ku tedbîrê xweparaştinê bistînin belkû bi têçûyeke kêmtir ku derfet hebe hereketa xwe bîdomînîna û wextê derfet nebe

jî bikarin wan destkevtên ku heta niha destxistîne wan biparêzin, daku bo qonaxeke dinê bi awayekê ku hewce be li gor rêkxistînekê li gor tecrûbeyekê dahî zêdetir, mil bi milê rewşa girêdayî bi seranserê Îranê hereketê bikin, ne zêdetir û ne jî kêmtir yanî rewşeke hanekî dikare pêgeha gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê biparêze bitaybetî jî ew weke Navenda Hevkariya Partiyên Rojhilatê Kurdistanê, em dibînin bi awayeke mentiqî û waqî'î, li warê siyasî ve ew helwest û ew rênimayên ku girêdayî vê rewşê yanê bo gelê me digrin ew dikare alîkar be bo wê ku ew pira baweriyê di navbera gelê me de, tev partiyên me, bê paraştin da ku bikarin li hember pîlanên rejîmê rawestînin û kar û xebatên xwe li gor derfetên ku li ber destê wan in bîdomînînin.

P: Dawîn gotina we li derheq xwenîşandanên seranserî yên Kurdistan û Îranê çiyê?

B: Gotina dawîn ku bixwazim erzî we bikim ew raştiye ye ku, gelê Rojhilatê Kurdistanê û herwiha yê Îranê di vê serhildanê de yek raştî bo wan derkevt û ew jî ev e ku tenê bawerî bi îradeya xwe hebin tenê li gor îmkana û derfetên heyî vê serhildana xwe vê şoreşa xwe pêş bixin, yanî li gor waqî'îyetên ku

di vî dinyayê de heye yanê tedbîrê xweparaştina xwe û hêviyên xwe li ser wan raştiyên heyî ava bikin daku, dûr li aliyê heştekê li aliyê weh û xeyalat ku hinek alî bixwazîna xelkê li gor îhsasatên demkî tehrîk bikin lê, ya reştî ev e ku em dibînin dinyaya îro di gonaxeke girîng de ye, ewa ku paşî şerê Rûsiyê û Ukraynê ku bûye rojeva dinyayê, aliyeke dinê jî ew rîqabeta di navbera zilhêzan de li gor wan hevkeşeyên siyasî, berjewendiyên wan ên stratîjîk ên di Rojhilata Navîn de an hin cihên dinyayê de bi hev re nakok in, ew di demek ha de mixabin hîn maye ku mijara demokrasîyê û mafê mirov û ew serhildana ku niha li Îranê de heyî bo wan bibe mijara rojê an bibe bi sertîtra rojnameyên wan, ku wisane, yanî ew bawerî bixwebûna xelkê dikare li gir raştiya heyî vê xebatê pêş bixe, neçî mo'îzizyek çavnehêrê hindê nebin ku yê çê be an çî hêzeke dinê yê derve yê bê vê rejîmê bo wan biroxiye, ku wisane ev ne li ser îmkana xwe li gor waqî'îyeta heyî çawan xwe rêk dixin bi piştîvaniya partiyên xwe yên siyasî ku niha di meydana de heyî neku li yê ku heyî yê ku li Ewropayê de rûniştîbin û destûrê bîdin wan û meydana emel de jî tehemula çî mesûliyetekê nekin li hember serniwîştîna xelkê ku, xelk çawan tîn

kuştin an xelk çawan penaber dibin, an tîn girtin ku nekare çî himayetekê li xelkê bike an nekare çî xizmetekê wan re bike, ku wisane di cihê xwe de ku xelk bi berçavgirtina wan raştiyên han xwe sazmandehîtir bike xwe yekgirtîtir bike, hemahengiya di navbera neteweyên Îranê û pêwendiyên wan bi çîn û qatên cur bi cur, yê derfeta vê hindê çê bike ku eger îro jî bi her sedemekê be ew serhildana an qonaxên demkî de tê pêşbînîkirinê ku lawaz bibe ya rejîm bo heyameke demkî bikare kontrol bike lê, di derfeteke din de ew serhildan yê careke din biteqe, bi wan tecrûbeyên ku dest xwe xistinî bi vê rêkxistina kirî bi vê yekgirtina heyî bi vê bawerî bixwebûna heyî aha yê hingê bikare netîceyeke baştir ji niha heyî bi dest bixe li demeke wisa de, hingê ye jî hêzên elaqedar bi berjewendiyên xwe li Îranê de yê hesabê li ser hereketa xelkê bikin, ez bawer im hingê yê helwestên wan jî bo piştîvaniya vî raperîna yê zêdetir bibin

Spas bo we rêzdar Mihemedsalh Qadirî, Berpirsê Nûneratiya Pêwendiyên PDKÎ li Hewlêrê û spas bo we ku dema xwe bo rojnameya Agirî terxand kir. serkevtinê ji we ra.

Peyama pîrozbahiya PDKÎ bo bidawîhatina sêyem kongireya PSKê

Partiya Demokrat a Kurdistan a Îranê bi hilkefta bidawîhatina sêyemîn kongireya Partiya Sosiyalîst a Kurdistanê li Bakurê û hîlbijardina sekreterê nû "Bayram Boyzel" peyama pîrozbahiye şand.

Deqa Peyamê wiha ye:

Hevalê rêzdar "Bayram Boyzel", Serokê PSKê

Tevî silaveke birayane

Bi kêfxweşî ve me nûçeya bidawîhatina serkevtiyane a kongireya we a sêyem û herwiha hîlbijardina we wek serokê PSKê bihişt.

Li ser navê PDKÎ em bi germî pîrozbahiye li we hevalê rêzdar û serokatiya nû dikin û em hêvî dikin hûn di pêxema xizmet bi doza Kurd li Bakurê Kurdistanê û bideştîstina armancên gelê Kurd serkevtî bin.

Partiya Demokrat a Kurdistan a Îranê



Navenda Pêwendiyên Giştî

Serkotbûn Êdî Sembola Azadiyê ye



N: Nuran Koyuncu

Jîna li ser goristana ku gora wê tê de ye ya Seqizê bi hezaran însanan ve hat bi bîr anîn. Beriya wê rêxistinên li rojhilata kurdiştanê bangî gel kiribûn ji bo tevlibûna çileyê cangoriyê. Ku bangî gel nekiraban jî dîsa dê bi hezaran însanên tevlî rêûresma çile bibûyan. Her çiqas hêzên rejîma xwînxwar û terorîst rêyên hatin û çûyîna li Seqizê bigre jî gel bi peyatî wek robarekê herrikiyan li ser gora Jînayê. Bi hev re sirûda neteweyî “Ey Reqîb” bi coş xwendin. Xwendina sirûdê li esmanê Seqizê deng veda bû hêviya kurdên her parçeyên Kurdiştanê. Bi yek dengî, bi qîrînî dirûshmên Kurdiştanî hatin gotin; “Kurdiştan Kurdiştan goristana faşîştan.”

“Heta kurdek bimîne dê Kurdiştanê bimîne.”
“Azadî, Azadî Azadî.”

Keç û xortan sonda tola cangoriyan, sonda azadiya Kurdiştanê kirin. Dêya Jînayê wek ritûeleke bi cil û bergên kurdî ve li ser gora qîza xwe serê xwe serkot kir porê xwe vekir, hejand da yalîkî. Por wek ala rengîn wek ala serhildanê hejiya. Bi vî awayî careke din serbilindîya kurdan, azadî jiyînheza kurdan nişanî li dinyayê da. Jin û mêr, zarok û ciwan li gel hev di welatê xwe de, di bin sîya ala rengîn de careke din daxwaza azadiyê kirin.

Kurd ne tenê îro her wext bi serbilindî ji bo welêt ji bo pêşeroja xwe, ji bo hebûna xwe ango kurdûna xwe, dîrok û çanda xwe wekî her carê xweyî derketine dê derkevin jî. Tenê wekî her



neteweyan, însanan dixwazin bi serbilindî bijîn. Têdikojin ev mafê xwezayî li Dinyaya bêdeng bidin qebûl kirin. Ka li Dinyaya bêdeng ji vî dengî çiqasî bibihîze em ê bibînin, li bendê ne..

Serkotbûn, porkurkirin êdî simbolên serhildanê ne. Ne tenê xwestina azadiya jinan e.

Rêûresma çilêya Jînayê daxwaza azadiya Kurdiştanê, daxwaza jiyaneka bê kuştin, birûmet e. Di destpêka xwepêşandanan heta niha Kurd her roj cangoriyên xwe dispêrin axê vedigerin têkoşînê û ji dil û can xwe bi doza ve xwe girêdidin. Ne tiştekî hêsane ku bê hewandin; her roj law û qîz, xwişk û bira, dê û bavên te bêne kuştin. Tu jî ji mirinê bikî para jiyanê xwe bê tirs û bi xwebawer têbikoşî. Ne hêsane her roj ji pey mirina ciwanan li ser xwe biminî. Ne hêsane ji dûr ve perritina kezêba dê û bavan binî ziman.

Ne hêsane ji bo dê û bavan qîz û xortên bêmiraz bispêrî axê, şîna wan nekî! Belê hîç

hêsane nîne! Lê kurd kêvir didine ber dilê xwe, xema xwe didine yalîkî têdikoşin. Ji xwe Rojhilatî ne tenê îro tene kuştin. Her roj di bin desthilatiya mollayên xwînrî de bi mirin û kuştinê re rû bi rû ne, li ber çavên zarokên xwe tene bi darve kirin. Wekî her demê îro jî pirranî ciwanên wan an dikujin an jî direvînin û dibin cihên ne diyar. Mixabin dê di bin tehdeyan pê ve pê ve bêne kuştin.

Rejîma olîgarşîk ji bo domandina kêf û rehetî û dewlemendiya xwe her zilm rijandiyê û dirijînin jî. Wekî tene zanîn li Êranê erk û dewlemendiya dewletê di destên hizbekê de ye. Bi zagonan ve vî erkê bi zorê darê didomînin. Beriya şah jî, ji pey şah jî di hedefa wande kurd hebûn. Zilma mezin li ser kurdan hatiye kirin. Li dijî vî zilmê kurd rabûne li ser xwe. Lê rejîman bi hovane tene birine. Rêberên wan an bi darve kirine wek pêşewa Qazî Muhammed û rêhevalên wî an jî li deverên EwruPAYÊ bi komployan kuştine wekî Dr Qasimlo û birêz Şerefkendî. Kurd di rêça wan

de li dijî rejîma îroyîn dîsa rabûne.

Wûsa xuya ye Rojhilat helwesteka jixweber digre dê tu carî dev ji vî helwestê bernede jî. Rejîm her çiqas zextê lê bikê jî her carê gavekê zêdetir ber bi şoreşê davêjin. Ji çil rojî zêdetir e li Rojhilata Kurdiştanê hema hema her bajar û deveran Kurd bi şev û rojan li kolan û şeqaman in. Wekî di salan 1979 î seranserê Êranê bêhna serhildanê ji xwepêşandanan tene. Bawer dikim mîna di sala 1979î li Êranê lihev kirina dijberan heye. Vê gavê serhildan bi awayekî jixweber didome, belavî li her deverê dibe.

Di dawiyê de rejîmê biguhere an reformên pêk bînin, hêj nizanin. Bes heke ku serhildan tene biçe ku naxwazin bi lev bikin mixabin lê metirsiya komkujiya kurdan heye.

Hêviya me ev serhildan bi serkeftî biqede û êdî kurd neyên kuştin.

Nerîna Lîderan



“Robert Malî”:

Pêwîstiya Îranê bi siyaseteke nû heye, ne çîrokeke nû



“Nêçîrvan Barzanî”:

Em hêvîdar in hikûmeta nû ya Iraqê bibe destpêka dawîhatina êş û azarên xelkê.



“Mehmet Ali Cevherî”:

Pêwîstiya me bi piştgiriya HDPê heye



“Emîr Ebdullahyan”:

Me dron dane Rûsyayê

Îran êdî bombeya etomî dixwaze!



N: Eskender Ceiferî

Malpera CNN ya Amerîkî ragihand ku Tehran ji Mok-soyê dixwaze Rûs alîkariya wan bikin da ku Îranî zûtir bombeya etomî çê bikin.

Dibe ku hem bandora rewşa navxwe û serhildana xelkê û hem jî bandora şerê Ukraynê li ser biryar û helwên Tehranê li ser vê mijarê hebe.

Di salên derbasbûyî de rejîma Îranê hertim îdia dikir ku ew bombeyê naxwazin û ewê careke din Danûstandinên Etomî dest pê bikin.

Di dema desthilatdariya Hesên Rûhanî de, roja 14ê Reşemeya 99’an, Mihemd-cewad Zerîf wezîrê derve yê rejîma Tehranê ragihand ku êdî rêkeftina Etomî ji aliyê wan ve nakeve ber bas. Ev jî di demekê de bû ku welatên Berîtanya, Feranse û Alman-yayê ragihandibûn ku ji bo nîşandana niyazpakiya xwe, reşnivîsa li dijî Îranê nadin Ajansa Navdewletî ya Etomê.

Pişt re Donald Trump ser-rokkomarê berê yê Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê dewsa xwe da Joe Biden û dihat pêşbînîkirin ku dewleta Biden vegere ser gotûbê-jan ji bo rêkeftina etomî bi Îranê re. Di vê navberê de Rêformxwaz hertim dibêjin rêkeftinê dixwazin lê Sipaha Pasdaran dibêje nabe rêkeftin bê kirin.

Îranê balafirên bê pîlot dane Rûsiyê da ku di şerê Ukraynê de bi kar bîne. Li navxwe jî xwepêşanderan dîkuje. Hemû ev kiryar bûne sedema dor-pêçên zundtir li ser Îranê û êdî ew ji rêkeftina etomî dûr dikeve.

Di raştî de armanca re-jîma Tehranê berhemanîna bombeya etomî ye. Ew, demê bi kar tînin û bi meyandina Oranyoma zêdetirî 20 ji sedî, nêzikî berhemanîna bombeyê dinbin.

Niha dewleta Biden jî dixwaze rê li ber Îrana Etomî bigire û ragihandîye ew dixwazin ji bo rêgirîkirin ji berhemanîna bombeyê ji aliyê Îranê ve her karî bikin.

Îsraîl jî bi Amerîkayê re hevnerî e û dibêje nabe Îran bibe xwediya bombeyê.

Komara Îslamî jî bersiva berpîrsên Îsraîlî û Amerîkî dabû û gotibû: Wê cihan wan gunehbariyên ku rayedarên Îsraîl dike, ji bîr neke. Piştî ku Donald Trump peymana etomî ya bi Îranê re bi tundî rexne kir, Rex Tillerson wezîrê Derve yê Amerîka jî xweşt rêkeftina etomî ya bi Îranê re were guherandin û jinûve were nivîsandin lê ji bo razîkirina Îranê ew liben-da piştgirîya hevalbendên xwe yê Ewropî ne. Tillerson got jî ku xelên rêkeftinê têra xwe tund nîn in û rê li ber bernameya etomî ya Îranê nagirin ji ber vê jî ewê cara yekê bi Cevad Zerîf hevtayê xwe yê Îranî û wezîrên derve yê welatên ku peyman îmta kirine re, bicivin û mijarê gotûbêj bikin. Wê demê Sergey Lavrov Wezîrê Derve yê Rûsyayê ku ji bo Civata Giştî ya Neteweyên Yekbûyî li New Yorka Amerîkayê bû, li ser helwesta Amerîkayê ya di derbarê Îranê de dabû xuyakirin ku helwesta neli-hevkirinê ya Donald Trump serokkomarê wê demê yê Amerîkayê ya derbarê Îranê de û rexnekirina bernameya etomî ya Îranê cihê fikarê ye.

Feranse, Berîtanya û Almanya difikirin ku eger Îrana Etomî bikeve Ro-jhilata Navîn, ewê pêgeha xwe ji deşt bidin. Lewma jî reşnivîsa li dijî Îranê nedan Ajansa Navdewletî ya Etomê ji bo ku niyazpakiya xwe nîşan bidin û Îranê vegezin

ser maseyê. Lê bi daxuyaniya Zerîf, derket holê ku êdî Îran rêkeftinê naxwaze.

DYA bi raportên çalakiyên etomî yê Îranê re bi baldarî riftarê dike û gotara weza-reta Derve ya Amerîkayê hemû wan pirsyanan bersiv nade ku çima Amerîka di îmtzekirina raportan de dudil e û sedem çî ne lê bi gotara Hesên Rûhanî zelal dibe ku dor-pêçên nû yê aborî, gefê li rêkeftinê dîkin. Rêkeftina etomî di roja 14ê Tîrmeha 2015an de bi tevlibûna welatên ewropî hatibû îmtze-kirin û li gora wê, Îranê hin çalakiyên etomî kêm dikirin û di hember de jî dor-pêçên aborî li ser Îranê dihatin kêmkirin.

Îsraîlê jî destpêkê ve ragi-hand ku ew, vê rêkeftinê naxwazin. Beriya niha jî berpîrsên saziya Nehêlana Çekên Etomî ragihandibûn her qasî ku Îranê bi hemû wan welatan re lihev kiri-ye, lê çavên Ewropîyan li Amerîkayê ne. Her biryarekê ku Waşington distîne, ji wan re dibe bandor. Berîtanya hewl dide DYA razî bike ku raportên li ser çalakiyên etomî yê Îranê demlîdest îmtze bike lê Trump li pey planeke din digere.

Ji bilî berpîrsên bilind ên Îs-raîlê, fermanarên wan jî di-din xuyakirin ku eger rêkef-tin bê kirin, Îrana Etomî, wê Rojhilata Navîn dagir bike.

Almanya, Berîtanya û Fe-ransê ku rolele mezin di rêkeftinê de hene, dibêjin bi meyandina 20 ji sedî zêdetir a Oranyomê, êdî derfet ji bo rejîma Tehranê çê dibe ku zê-detirî berê bo ser cihanê bibe gef. Di beşeke din a daxuy-anîyê de tekez hatiye kirin ku meyandina vê asta Oranyomê ne ji bo karûbarên pîzişkiyê û ênêrjiyê ye lê belê li tevahiya cihanê, ev asta Oranyomê tenê ji bo karûbarên çek û berhemanîna bombeyê tene bikaranîn.

Şoreş û Nîv-Şoreş di şoreşa Jîna de



N: Ebdûlazîz Qasim

Îro piştî derbasbûna bêhtir ji heyv û nîvekî li ser şoreşa xelkê Îranê û Rojhelatê Kurdistanê li dijî rêjîma Îranê ya mirovkuj, xuyaye ku xelkê Îranê li ser berde-wamiya şoreşa xwe mukire û dîtir vegeer ji vê şoreşê nabe her nirx û qurbanî çend giran be jî, bi wateyekê ku bûye şoreşa man û nemanê, cuda ji şoreş û serheldanên salên berê yên demkurt, dibêjim ku xelkê Îranê ji serbora xwe baş dizanî, tevî xemsariya civaka navdewletî û saziyên Neteweyên Yekgirtî, ku nabe şoreş bihête rawestandî û divê berdewam bimîne heta bigehêje encamek erênî di berjewendiya xelkê Îranê de be, berovajî ku heger şoreş bihête rawestandî dê encamên xirab li ser çarenivîsa gelê Îranê hebin, ji ber vê yekê dibînin ku ji aliyê xelkê serheldêr û xwepêşanderan ve, rojane form û terzên nû yên nerazîbûn, grev û xwepêşandanan tene dahênan bo dirêjdana şoreşê.

Wisa dixuye ku gelê Îranê bi rêka azmûna xwe ya dewlemend ji serhildanên berê, agah ji gotinên rêberê Çînê Mao Zedong heye demê dibêje: ku kesê bi nîv şoreşê rabe, gora xwe dikole”, ji ber wisa ku berdewamiya şoreşê her çiqasî qelen biha be jî dikeve di berjewendiya xelkê serheldêr û azadîxwaz de, berovajî ku rawestandîna şoreşê yan jî “nîv şoreş” dê bikeve di berjewendiya rêjîmê de, û berî demekê heya astekê xuya bû ku “nîv-şoreş” xwestekê rojavayî jî bû, ku Amerîka û Ewropa hewl didan ji bo bikaranîna şoreşa #Jin_Jiyan_Azadî ji bo wajokirina hinek bazar û girêbestan digel rêjîma Îranê, bi taybetî li ser dosya Navokî



ya Îranê, lê niha ew dem derbas bûye, ku îro şoreşa xelkê Îranê ketiye di rojeva helbijartinên xula navdemê yên Amerîka de (United States elections, 2022), li 8'ê Mijdarê di navbera komarîxwaz û demokratên de, herwiha piştî derketina belgeyên bihêz li ser çekên Îranê ji aliyên hêzên Rûsî ve di şerê Ukrayna de, zêdebarî ku helbijartinên Îsraîlê yên vê carê ne tenê wek helbijartineke asayî xuya dike, ku wekî referandumekê bi rêberiya Netanyahu xuya dike, girêdayî pirsên siyasî û ewlehiyê yên Îsraîlê û di nav de bi taybetî dosya navokî ya Îranê.

Bi xwandina min serdema “Nîv-şoreş” ne tinê li ser astê navxweyî û Ewropa, Amerîka û Îsraîl jî derbas bûye, lê belê heta ku Rûsiya jî niha kar dike li ser vê yekê û serdana vê dawiyê ya wezîrê derve yê Rûsiyê bo Urdinê, nêzîkbûna bidawîhatina rola Îranê li Sûriyê piştraşt dike, û dîsa bikaranîna çete û kirêgirtiyên Hizbullah û Heşda Şeibî bo serkutkirina xwepêşanderan, belgeya îflasa navxweyî ya rêjîma Îranê ye û zêdebarî bargiraniya krîza aborî û herifîna nîrxê diravê wê bi awayekê kêmwêne, lewra li ser astê navxweyî, herêmî û navdewletî wisa diyar dibe ku şoreş dê berdewam be û helbet dê bigehêje encamên erênî bo paşeroja Îran û Rojhelatê Kurdistanê dergûş û landika vê şoreşê.



Selîm Zencîrî: "Rewşa niha ya Îranê ji zaf biyavan ve ciyawaz ji berê ye"



Selîm Zencîrî: Berpirsê Navenda Hilbijartina PDKÎ

Min digel rêzdar Selîm Zencîrî Berpirsê Navenda Hilbijartina PDKÎ li derheq serhildana nû ya Îran û rewşa Îran ya nihahevpeyvîn encam da navbirî got: "Rewşa niha ya Îranê ji zaf biyavan ve ciyawaz ji berê ye".

P: Hûn dawîn bûyerên Rojhilatê Kurdistanê û Îranê çawa dinirxînin?

B: Agirê serhildana ku li pey şehîdkirina Jîna Emînî li Kurdistanê de vegeşiya, bilez gurî û peşqelên xwe li dijî rejîmê bo hemû Îran û cîhanê avêtin.

Serhildanek ku xwîna keça Kurd hêvênê wê, nîştimana wê jî alahilgir û jinên Kurd jî pêşenga wê ne. Serhildanek ku ciyawaz ji berê, tewawiyeta rejîmê bi armanc girtiye û roj bi roj xurt dibe.

Bi wateyeke din, xebata gelên Îranê li dijî rejîma terorîstî a Îranê piştî şehîdkirina Jînayê derbasî qonaxek nû bûye û piştî çar dehikan ji deştilatdariya rejîmê, îro xwaşt hevbêş a hemû netewe û pêkhate û tex û qatan, herifîna vê sîstemê ye.

Duruşmên "jin, jîyan, azadî" û "Mirin bo şemkar, çî şah be û çî rêber" koka vê sîstemê hingavtine. Îro-rojê ne tenê gelê Kurd, belkî gelên Fars, Belûç, Erebi, Azerî û hemû tex û qatên civakê li dijî rejîmê rabûne. Jin û xwendekarên zanîngeh û dibistanan berdewam li qadan in. Bi heman awayî Kurd û Îranîyên li Diyas-

pora û derveyî welat jî meş û xwenîşandanên girseyî lidar xistine ku bandorek mezin ji raya giştî a cîhanê û pêwendiyên zaf welatan bi rejîmê re kiriye.

Ev yek, nîşaneyên baş in ji hevdengî û yekîtiya navbera gel û xelkê Îranê serbarê hemû hewlên afirandina dubendî û alozî, pîlan û propagandeyên rejîmê.

Lewma rejîm serbarê teperî, girtin, kuştin û gefan nekariye wekî berê şeqaman kundirol û dawiyê bi serhildanê bîne. Jiberku ji zimanê zorê zêdetir çî nizane û dixwaze agir bi agir bitemirîne!

Bi giştî rewş û hevkeşe guherîne û heta eger serhildan sist û xaw jî bibe yan rejîm bikare kundirol bike, dîsan ji nû ve deşt pê dike. Jiberku civak wek bermîlek barotê ye, sebr û hedara gelan ji bindestî û zordestiyê nema ye û çirîskeke piçûk dibe sedem ku carek din weke borkanekê biteqe. Lewma bi geşbînî ve mêzeyî roj û mehên pêşiyê dikim.

P: Rêzdar Selîm Zencîrî, hûn beşdariya tex qatên cuda yên Rojhilatê Kurdistanê di vê serhildanê de çawa dinirxînin?

B: Rewşa niha ya Îranê ji zaf biyavan ve ciyawaz ji berê ye. Jiberku ji haleta xwenîşandanan derbasî serhildanê bûye. Wate berdevamiya xwenîşandanan, giştgîr û seranserîbûna wê, radîkalbûna durûşman û berfirehbûna şeqara navbera xelk û rejîmê ji xalên cuda-ker in. Her çar paremetran bi cidî cewhera nîzama totalîter bi nîşane girtine.

Xala balkêş a vê serhildanê, beşdariya çalakane û pêşengbûna jinan e, xwenîşandan û hawara xwendekaran di nav pîraniya zanîngehan de tê dîtin û bihîştin. Serbarê mezaxtina bûtceyeke zaf bo perwerdeya îdeolojîk, lê qutabiyên dibistanan zêdetirîn rol di vê



serhildanê de hene. Karker û mamosta û hemû texên ci-vakê kêr û zêde li şeqaman beşdar in ku tiştek kêrwêne ye. Bi taybetî, Kurdistanê vê carê jî selimand ku serbarê hemû cinayetên, dîsan kelha berxwedan û xebatê ye li dijî faşîzma mesebî a Tehranê, qahîm li pişt tevgera siyasî a xwe sekiniye û li halê vegu-hastina ezmûnên serketî ên xwe bo deverên din e.

Vêca ji ber vê ku rojên di-jwar li pêşiya me ne, hewce dike serbarê domandina serhildana Jînayê, ruha tilorans, berxwedan û yekîtiyê û coşdana xebatê bihê bihêzkirin, daku ruha Jîna û Jînanan aram vehese û dara azadiyê jî ber bigre.

P: Rêzdar Selîm rewşa rojnamevanên Kurdistan û Îranê ku li dijî rejîmê û li derve çalakiyan encam didin çawa ye?

B: Bi giştî rojnamevanî û karê ragihandinê li welatên dîktatorî de, pîşeya herî metirsîdar e.

Ji berku ew, çavê tûj ên ci-vakê ne, û bi ked û tekoşîna xwe dixebitin ku ji riya zanîyariyên rast û durust ve ci-

vakê şiyar, ronî û zîndî bikin, ku ev resalet jî tam berevajî xwaşt û heza sîstemên dîktatorî ye.

Çûnkî ew bo parastina xwe, di hizra xurtkirina tarîperestî, xurafat û paremayîne ji riya dezgehên propagandeyî ên xwe ve ne. Rejîma Îslamî a terorîstî ya Îranê jî di çarçoveya vê hizrîne de cî digre û Îran kiriye mezintirîn girtîgeh bo rojnamevanan. Sansor, qutkirina internetê, revandin û dizîna rojnamevanan, girtin û kuştin û hukmên giran bo rojnamevanan, parazît, filterîng û ... hwd wusa kiriye ku raya giştî a Îran û cîhanê ji zaniyariyên hewce û durust li dor teperîyên hovane û pêpêskariyên mafên mirovan ji aliyê deştilatê ve kêmhay be û di dema xwe de nekarin helwest yan reaksiyonên hewce nîşan bidin.

P: Pêka rapora nûçegihanên bêsînor, rejîma Îslamî di wê heyamê de 43 rojnamevan binçav kirine, gelo we ti zaniyariyek li derheq rewşa rojnamevanên hepskirî de li ber deşt heye?

»»»Doma R:9

B: Belê Îran di asta cîhanî de, piştî Çîn û Miyanmarê, sêyem welat e ku bûye bi dojah ji bo rojnamevanan û her ku diçe rewş xirabtir jî dibe. Bi taybetî ku niha rewşa siyasî li Îranê tevlihev e û serhildanek mezin di rojevê de ye, tê payîn ku rewşa medyakan xirabtir be jî. Bêguman her kes dizane rewş û hukmê cudabîran û rojnamevanên girtî û bi giştî girtiyan li Îrana di bin desthilata Komara Îslamî de bi çi awayî ye. Ne tenê li navxweyî welat, heya li derveyî welat jî li dû rojnamevanên çalak û serbixwe de ye, vêca çi bi gefxwarin be, çi bi terorkirin û revandina wan. Di vê çarçoveyê de ye ku rêxistina nûçegihanên bêsînorbaz ji girtina 43 rojnamevanan dike û hişdariyê li dor xirabtirbûna rewşê jî dide.

P: Rêzdar Selîm berdewam dibînin ku li cihên cuda yên Îran û Kurdistanê, di hereketeke şoreşgerî de xelk binkeyên besîcan û navendên girêdayî rejîmê agir didin, vê mijarê çawa dinirxînin?

B: Ji destpêka serhildana Jînayê ve heta niha, xelk bi awayekî şarîstanî û aştîxwazane li ser şeqaman bûne û li dijî cinayet û tundûtûjiyên rejîmê silogan avêtine ku eva jî tiştekî normal, surûştî û rêpêdayî

di hemû dunyayê de ye, lê eva rejîma terorîstî ya Îslamî a Îranê ye ku cehd kiriye û dike ji riyên tepeserî, kuştin û hovêtiyê ve xelkê bédeng û serhildanê jî bifetisîne. Di çarçoveya van hovitiyan de heya niha bi sedan kes ku di nava wan de nêzik 50 zarok jî hene, di nava xwîna xwe de gewizandine.

Bi hezaran kesî girtine û birîndar kirine, her ku diçe, şidet û hovêtiya xwe zêdetir jî dike, mal û dukanên xelkê û samanên giştî têk dide û ...hwd. Ewe jî doma siyaseta sistematîk û di heman demê de dorandî ya rejîmê ye ku serê çar dehikan e hewil daye bo rewayîdana bi fetisandina wan dangan û temirandina agirê nerazîbûnê, wan xwenîşandanan girê bide bi biyaniyan, û belgeyên sexte di propagandeyên xwe de bona xapandina raya giştî nîşan bide.

Niha jî bi heman awayî berdewam dixebite ku rûyê vê serhildana aştîxwazane bi kiryarên wusa kirêt bike. Her çend ku di yasayên navdewletî de, berevaniya rewşa mafek surûştî ye, lê rejîm bi gulleyên şerî sîngê ciwanan dihingive û şeqam û bajar kirine bi qadên şer, û mizgeft, pirtûkên pîroz, cihên giştî dişevitîne û qutabxane û zanîngehan dike cihên leşkerî, kereştayên veguhasîna giştî dixebite xizmeta hêzên tepeserkar ên xwe de

û ...hwd. Di rewşeke wiha de gelo mirov dikare çi navekî li vê hovêtiyê, bêexlaqî û bêpîrensîpiyê bike? Yan eva ku niha bi êşkere bi bilindgoyan gefa serjêkirina xelkê li egera valanekirina şeqaman dikan, tenê ew reftar kêrî bejna Komara Îslamî û zaroka îdeolojîk a wê (DAÎŞ)ê tê!

Di hember de ger binkeyeke leşkerî yan navendek ku destê wan di kuştina xelkê de heye tê şevitandin, eva di çarçoveya berevaniya rewşa de tê pênasekirin. Bi her hal ev rejîma zarokkuj ku di çend hefteyên derbasbûyî de berbirûyê vê serhildana bêhempa bûye, cîhan û derverê aramiyek mezin bi xwe ve ditiye û zaf kirîz û pirs-girêkên mezin û kevînar ku destê rejîmê di afirandin û mezinkirina wan de hebû, di vê midehê de çareser bûne.

Ew jî vê yekê diselimîne ku dujminê herî mezin bo evlehiya dever û cîhanê ku makeya teror û ajawê, dubendî û cinayetane, Komara Îslamî ya Îranê ye, û cîhana bîyê vê rejîma zarokkuj û terorîst, evlehî û armaiyê bi xwe ve dibîne.

P: Erk û rola Kurdan di vê rewşa heştîyar de çi ye?

B: Gelê Kurd mêjdem e ku cewher û rûyê rastîn ê rejîmê nas kiriye û serbarê ezmûnkirina hemû cur û metodên mirinê, lê stûxwar

nebûye. Niha jî gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê bi pêşengiya tevgera siyasî a xwe (Navenda Hevkariyê ya Partiyên Kurdistanê ya Îranê) ku temsîla piraniya rûniştvanên Rojhilatê Kurdistanê dike, gav bi gav li gel bûyeran diçe pêş û yekîtiyê û hevdengiyeke baş heye, lê renga tîrê neke û hewce ye bona pêşgirtin ji dubarebûna dîrokê û her pîlan û dek û dolabeke neyaran, serbarê berdewamîdan bi vê serhildanê, li cehda xurtkirina yekîtiya navmala kurd û berfirehkirina Navenda Hevkariyê weke sîvanek kurdî bi yek pakêca netewî bi aliyên din re bikevin gotûbêjê. Madam ku hêvîyê vê serhildanê xwîna kurdan e û starta wê jî Kurdistan, hewce ye Kurd xwe bi xwediyê vê serhildanê bizanin û wek ektereke xwebawer û teyar bi piştevaniya piraniya xelkê Kurdistanê di hevkeşe û hevbendiyan û şerê dariştina destûr bo sistema pêşerojê de derbikevin. Nexwe aliyên oportonîst hene ku di boseyên monopolkirina vê serhildanê, şibî şoreşa 1979'an a gelên Îranê de ne.

gelek spas spas rêzdar Selîm Zencîrî Berpirsê Navenda Hilbijartina PDKÎ, ku we dema xwe bo rojnameya Agirî terxan kir. Serkevtên ji we ra.

Hêzên rejîma Îranê li Urmîyê bi kom ciwanan biçav dike

Li bajarê Urmîyê hêzên ewlehî yên rejîmê dest avêtine bi binçavkirina bi kom a welatiyan û di navbera du rojan de zêdetir ji 20 ciwanên Kurd li bajarê Urmîyê hatine binçavkirin.

Li gor nûçeya ku gihîştîye bi malpera "Kurdistanmedia"yê hêzên ewlehî yên ser bi Spaha Pasdaran, di navbera du rojan de li bajarê Urmîyê dest avêtine bi binçavkirina bi kom a welatiyên Kurd û ji her kesî şik û guman hebin binçav kirine.

Çavkaniya aghedar daye zanîn ku, li 13 û 14ê Xezelwerê, hêzên ewlehî yên Spaha



Pasdaran li bajarê Urmîyê êrîşê ser qehwexaneyan kirine û ji her kesekî şik û guman hebin bi awayekî hovane binçav kirine û bo girtîgehên ewlehî veguhastine.

Wê çavkaniyê gotiye: Hêzên ewlehî yên rejîmê serdana hemû qehwexaneyên Urmîyê kirine û her qehwexaneyek vekirîba, dirijiyane ser welatiyên wir û bi xwe re dibirin.

Di berdewamiyê de wê çavkaniyê daye zanîn, ku heta niha zêdetir ji 20 ciwanên Kurd yên Urmîyê di wan du rojan de hatine binçavkirin.

Binpêkariyên mafê mirov di Kurdiştanê de

Saman Yasîn” hunermenê Kurd bi tohmata “dijayetî digel xwedê” hate cezadan

“Saman Yasîn” hunermendê Kurd yê binçavkirî û xelkê bajarê Kirmaşanê, ku rêkevta 10`ê Rezbera sala 1401`an a Rojî, li meşa xwenîşandanên seranserî li bajarê Tehanê hatibû binçavkirin, ji aliyê dezgeha dad a komara Îslamî bi “dijayetî kirin digel xwedê” hat tohmetbarkirin.

Kombûna dadgehî kirina wî hunermendê Kurd ê temen 27 salî, roja Şemî 7`ê Xezelwera sala 1401`an, li dadgeha Giştî û Şoreş a bajarê Teheranê bi serokayetiya dadwer “Selewatî” digel 8 binçavkariyên din ên bi navên “Mihemed Qubadlû, Muhsên Rezazade Qeraqlû, Se`îd Şîrzad, Mihemed Birûxenî, Ebulfezl Mêhrî, Husên Hacilû, Menûçêhr Mêhmannevaz û Sohêl Xoşdêl”, birêve çûbû.

“Saman Yasîn” di wê dadgehê de bi “dijayetî kirin digel xwedê ji rêya teqe kirin bi demançê û çeka j3” û “kombûn û nearamî bi mebesta encamdana tawan li dijî ewlehiya netewî” hat tohmetbarkirin.

Ewe di demekê de ye ku li gorî wê filmê ku di dadgehê de belavbûye, Saman rû li dadwer dibêje navbirî tenê çeka badî (çeka cûcîk kuj) heye.

Dadwer “Selevatî” ew hunermendê Kurd bi encamdana 11 cur kiryan tohmetbar kiriye ku “Saman Yasîn” ew tohmetên han red dike.

Tohmata “dijayetî kirin digel xwedê” yek ji wan tohmetan e bo kesên binçav kirî, metirsiya sepandina îdam kirinê heye.

Li gorî wê yekê ku li ser medyayên Komara Îslamî belav bûne, dadgehên pêragihîştin bi dosyeyên xwenîşanderên vê dawiyê, ji heftiya derbasbûyî ve deşt pê kiriye û heta niha 25 kes li parêzgeha Kirman, 89 kes li parêzgeha Simnanê, 119 kes li parêzgeha Zencanê, 105 kes li parêzgeha Xûzîstanê, 55 kes li parêzgeha Qezwînê, 110 kes li parêzgeha Sinê, 315 kes li parêzgeha Teheranê û 201 kes li parêzgeha Elborz, li gorî yasayên ceza yê îslamî, hatine cezada.

“Saman Yasîn” hunermendê Kurd û xelkê bajarê Kirmaşanê ştiranên zêde li derheq rewşa civakî-siyasî ya civaka Kurdiştanê û Îranê gotine û herwisa piştevanî li xwenîşandanên seranserî yê xelkê Îranê kiribû.

“Gulale Muradî” bi girtîgehê hat cezadan

“Gulale Muradî”, welatiya xelkê bajarê Pîranşarê, ji aliyê taya 3 a dadgeha keyferî ya 1 a li bajarê Mihabadê, bi girtîgehê hat cezadan.

Li gorî cezaya ku li dijî “Gulale Muradî”yê hatiye sepandin, di meha Xermanana îsal de, Gulale bi tohmata beşdarî kirin li kuştina bizanebûn a “Osman Hacîhusênî” bi 10 sal û rojek girtîgeha te`izîrî hatibû cezadan ku bi lêxweşbûna malbata xwediyê kuştî, dadgehê bi piştgirêdan bi benda elif ya madeya 37 û benda elif ya madeya 38, li yasaya cezayên îslamî pesendkiriya sala 1392`an, cezaya 10 sal û rojek girtîgeha te`izîrî ya “Gulale Muradî”, du car kêmkirin bi 4 sal girtîgeha te`izîrî û bi hejmarkirina heyama binçavkirina berê, hat cezadan.

Roja Yekşemî 4`ê Banemerê, “Gulale Muradî”, piştî salek û 7 rojan bi awayek demkî bi danîna barimteyê ji girtîgeha bajarê Urmiyê hatibû azadkirin.

Roja Duşemî 25`ê Rêbendana sala derbasbûyî, “Gulale Muradî” bona nîşandana nerizayetiya xwe derheq çarenivîs û pêrenegihîştin bi dosyeya wê, li benda jinan a girtîgeha bajarê Urmiyê deşt avêtibû bi gireva birçîbûnê.

“Gulale Muradî” ji roja Şemî 28`ê Xakelêweya sala 1400`an a Rojî ve, heyamekê bi awayek nexuya di girtîgehê de bû û di wê heyamê de ji mafê deşt pêragihîştin bi parêzer û hevdîtin digel malbata xwe hatibû bêparkirin.

“Gulale Muradî” di heyama binçavkirinê de, tevî azar û îşkencekirinê, bona wergirtina îtirafên bi zorê, berdewam di bin givaşê de bûye.

Sibêdeha roja Şemî 28`ê Xakelêweya sala 1400`an a Rojî, hêzên ewlehî “Gulale Muradî” tevî du zarokên wê yê bi navên “Metîn Bezazî” û “Tahir Bezazî” binçav kirin û bo lêpîrsînê bo girtîgeha Îtila`ata Spahê ya li bajarê Urmiyê veguhaştibûn.

Ew sê welatîyên Kurd piştî kuştina endamê Spaha Pasdaran yê bi navê “Osman Hacîhusêynî”, ji aliyê hêzên ewlehî ve hatibûn binçavkirin û zarokên “Gulale Muradî” piştî bidawîhatina heyama lêpîrsînê ji girtîgehê hatine azadkirin.

Meha Cozerdana sala derbasbûyî, “Gulale Muradî” piştî bidawîhatina heyama lêpîrsînê, ji girtîgeha Îtila`ata Spahê ya li bajarê Urmiyê, bo girtîgeha navendî ya wî bajarî hatibû veguhaştin

Agirî

◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdistanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE

E - Mail: Agiri2003@gmail.com

Hejmar (433)

Wêneyên xwenîşandanên serhildana seranserî li Kurdistan û Îranê

